Helbestên Anahîta Hemo
Bi zimanê kurdî bi navê "Sewdaliyê "

## Yadê

Ma qey biyanî dikare,
Dengê lavij  û destnimên te ,
Derîne tevlî baweriyên te ,
Ji hinavên zaroktiya min bi tere ,
Dengê te qube û bilindtir dibe ,
Dibhîzim  di giyanê min de maye ,
Pîrozin liven te ,nazenîne ,peyva ,yadê ,
Çendî şêrîne ,pîroztirîn jê nîne ,
AVA dilop dilop tê ji zend û bendên destnimêjê ,
Bi min reye vaye dengê te dikim ,barbenge ,
Vedgere, dîsa dizîvire ,
Xwe dughere dîsa li min vedgere,
Hemû ziman lalin ,bi hemû typan ,
Dayê ,yadê ,MAMA ,MAMÎTO ,
Pesindariyê vê spêdê sûndixum bi navê te ,
Bi wan ayatên ji ezberkirî ,wî rûyê te hingivîndike ,
Ji dema spêdê destpêka liva mine ,

Beyanî baŞ ,Roj baş spêde baŞ,diya min,
mane tu diya mine ,
Bi rondikên germ ,û kelek bê rawestan ,
Mîna kelkela bûyerên  bajarê min ,
Ji vê dem û Çaxên ji AR ,
Bi pênûsa min reye ,dinvîse ,
bi hemû şanên xwe ,
Dest berjorim bo hebûna
zelalbûna dengê te ,
Li ser darê jînê ,

,keftlefta ,temenê te ,
Bimîne ji mere ,Livên ,
Bi lavijan re ,
Destnimêjgirtinên te,Dilpake ,dayê ,
Bi hiş û hizir û bîre ,
Ji bîr nake kar û barên xwe ,
5-10-2003 .........Enahîta Hemo

# Bavê min

-Vaye ,"yabo",bi leze,
Ji kart ê ,dildare,
Hezkerê zarokên xwe ye,
Bi misk bîna xwêdana xwe,
Û dest jî bînên beybûna ,kare,
Pîroze xunave,xwêdane,

Rûbare,Çend pir û buhur ,
Bûrandine ,Ling jî qelaştiye ,
Li dûv daxwaza nasnamak kurde,
Bi doze ,bi hemû cergan,
Ji serê kiriye hirî ta lingên qelaştî,

-Destê rastê mêwe hilgirtiye,
Bi destê Çepê şînahiya dilê wî ye ,
Rûpîroziya pêşerojê ye,
Bi wî diranê rengê zîv ,
Zeredekene,asîv dida Çavên me,

Jiyana me dixemile,
di wê rojhilata xav de,
Bi hezkirina xwendinê ,

Eve peyama "yabo'
Hezker û hevjînê  rastiyê

PêŞeroja jiyana meye," yabo",
Kêlîkên me vala nemane,bê şahî
bi şahî,Vane ,xuŞk xwe pêldidindidin sema,
Her wiha jî bira yê biÇûkdibeze,
Li pêşwaziya te,heÇê berê gula zerê,
Wî ramîse ji aniyê ji hunarkên rûyan ji bêvilê ,
Naweste ji kenên şahiyê ,
Wê kî gorê rastê jêbixe ,
Wê kî gore Çepê jê deyîne ,
Bavê mine ,westiyaye,
Kolan bi kolan li dûv nasnama meye,
Ji şahiyê naweste di nêv jana de
Berdewame,bawermende,
Mijûlin zarok bi şiştina qeresî,
Di ber avjeniya xwede,mehên " xermanan",
Gelawêjin tîmehin,
Havîne,ji gema têrnabin ji avê,
Li nik darên "Lêmo" û gulan ,gulîstana malê ,

Mixabin,mîna Çirûskek lewend,
Tîrejek bezî,şahî ,livek sivike,
Kurte demek şêrîne,

Îro ,em bi tevaya xwe,
Gorî giyanê zû mîna Çûkekî firinde,
Firî zor ciwane,zemîn lime kir buhuşt ,
Bi bîranînên giranbiha,payedare,


Ji nêv me barkir ,

Hêja ye bavek şêrîne,
Êdî piyala zaroktiya me,dagirtiye,
Ji lîstokanji şahiyê,
Denbêjek guhdeze,
Bi bîranînên tere dijim ez,her kêlîkê,
Te mişt hişt dema min ,
Xwestekên te bi cih tînim ,
Berdewamim,Bi awazên te jiyan berdewame,
Emegdar,dilsoza Arezûyên teme,

Dojehên bajarê biÇûk ,
Bi têbîrên tere,dibin havîngehên bajarên ronahiyê "
parîsê ,
"şanzilîzê", strasbûrg" di hemû katjimêrên xwe,
Dilsoza dildariya teme,
Ji wî temenê herî biÇûk ,
Eve ,raste,ji minaliyê ,
Mirov matmayî dimîne li wî bajarê windayî
Li baweriyên başqe ser bixwe li wê ola " yabo ji bingeha
Mirovayetiyê ",
Li mirovayetiya"yabo " şaş diman li wê tara
Bajarê biÇûk,li goranênên te,
Li kalînadengê şoreşa kalê
Nemir,Miriyê mirovayetiyê ye,
Guhdarê "dengê kurdistane",
Meyaye êdî di hizir û bîra hemû beşên
Mejû de ,peyama kurdayetiyate,
Bi wan kurdên te hilgirtên "AVESTA".
Li baweriya te " yabo" ,
Digotin,mîna her carê berê ,û
Dibêjin Hêjî :" xewne kurdistana te ,

14-8-2006-Qamişlo

## Zava

Çil roj ên ji bendîxanê ,
Çog jî bûn ,xilxal,nema digerin ,
Bira ,can dilsare,bi hastên lihevketîne,
Dil bê hêz dibe ,ji qeşa ye ,
Bê Çare ,xemgîne ,
Berê te bi kudeverê de ,
Vekirine , tu jî tebayî tebaya ,
Hêstirno ,we nabarînim ,
Na ,Na ,Na ,we nabarînim ,
Girtina pîroz gemarnakim,
Ne qelsim ,Dilêrim ,keÇek kurdim ,
Hînbûme , li ser bûyerên ji nifşkê tên me ,
Lê dikelim bi kel û tijî rondikim ,firmskim,
Li hêviya pêşwaziya girtîgehan,Amedene,
Belê namirim ,,îro ,şahiya meye ,
Xwe dispêrim ahengan ,bi xeml û xêzim ,
Belavdikim şahiyê ,hevalno , ne cejna qurbanê ye ,
Nejî cejna remezanê ye ,
Ne jî zaîyna xiristiyana ye ,
Belam ,
Cejna me tevaye ,cejna azadiyê ye ,
Bi şal û şapikan ,
Bi kiras û xeftanên kurdî ,
Pêşwazî bikin ,bi wan al hildaye ,îro ,
Û sibe ,û disbe , berêzin ,lehengin ,
Xwendevanên di girtîgehan de rizyabûn ,
Bi weye sûnda me ,zavayên bûka nûjen ,
Kurdistan

Enahîta Hemo.

-1-

Dil soza sûrişta teme ,

çiyayê
Berwarê ,
Dildarek kevnare,

Emegdare,
Hijmekara teme,gundê
Hirorê ,ji bilî ava kanîyên te,
Welato,hîç zemzem nîne,
Xwe xûzdikim bo te ,
Bo ramîsanek ,nemirî,
Serdemî,bo axa pîrozkirî,
Bo destnimêjeke heîynî ,
Li şarêRANYE,birîndare,
Rojek ji jiyanî ,li ser xaka buhiŞtî,
Li himber hezar rojên buhiŞta `,
Pêximberên ,peyamên berê ,
Ji bilî lavijan zê Çi biwergirînim ,
Ji Êş û Azarên mirovên pêrgî wan
Bûm,gelo, 15 salên zindanê,
Û çend û çend salên pêŞmergayetî ,û
Çend 7 salên êşkencên,
Diktatoran,
Neb ê Çare ,bo mirov binase ,
Çêz û xenda zemîna rizgarkirî ,
Ji wan mirovan ,
Mirovtir hîç derbasnebûne ,
Li ser dîmenên hizir û bîrên ,
Ew xweŞ dibhîzin,Sazdikin,
Kalîna Qamişlo,
Nalîna Amed,
Fîxanên Mehabad,

Kewan xweş didin przûkirin ,
Ji lehengane,ji ezberkirine ,
PEYAMA, xwe ,
Êş û AZARên me ,
Dimînin ,hevalno ,ew derûnên
pak,bi ola kevnarên xwe, kalê
NEMIR,
Ji çend û çend Pakrewanan.

## *أ Bajarê Evînê*

**bi giyanek firi$ti firîme**
**Ho $adiyê minderbasneke,**
**Min bê par neke Îro cejne,**
**bi baskén xweyî tenik ,gulînî,tema$eke**
**Li ahenga rengînî ,meyzeke,**
**Bi hatina Avdaré ,me $ake,**
**Xweda , ma ne deme... Îro $abanu û**
**$ahî$aha deménxwe$iya**
**gelé xweme, li bajaré Silémaniyé**
**Dihokê Erbîla xweme**

**Meyzeke ;iro; Qami$loka Evinê bi kul û**
**giriye,**
**bûyerén wê hêjî li darin,xweda ma ne**

**deme ???????????,**
**Di bendixanê de di giravên birçibûnê de**
**westîyne???????,**
**zavên wê bê bûk mane..**
**bawerin bi rizgariya xwe û gelê xwe ..**

**HO cihanê ha ji arezûyên wé hebin bê çar maye**
**em jê bê parin jê bêparin**
**ji bûka Evinê ,bi vinin, da nebe**
**QAMI$LOKA xemginê**

-3-

# Goranyên civakî

Gorên cênoseydin,"Koral",

Veşartîne,kesnedîtî ,bi yasên keÇîndariya rojhilate,
Gorên jêre ,amedekirîne
,pesindariyê ,distirên,ji kuştina ayînî re
Goranî bêjin mirina keÇa kurd bi wê ola jêre tê pîvan,

Şabaş ji bercewendiyan  re,bi derûnên tên firotin,
Lavij têne gotin ,mirina dawiye ,"VALSE",bi wateya tariyê,
Bê wriyê ,bê zariyê ,
Û bê dengiyê ,Keftelefte ,bi nav û dengbûye ,
HELKEWTE,bîn bi şûnwariya wê ketiye ,
Her yek di gorek jêre kolayî ,taybete,
Ma te xwest "jînê" Mawe gore dijînê
Ma Çend qesene,Vane dikolin gewrene,
Axa aramgeha dîlan pîroze ,zore dîlî ,
Bi sanayî ye kolana tirban,
Bi saxî,pirr xeşîmtiye,
Geh nîroz qubana şêro ye ,
Geh rûkenê gorî cano ye ,
Û Çend û Çen qurban gerekin bo
jinx we ji wê dîliya gemar xwe veşo ,
Tu keÇe ,ji
AMEDê ,HELEBÇe ,MEHEBADê şehrezûrê ,
Hemû şar jî yekin ,kurdin,KeÇê xwe ne livîne ,
Şûr  jî Amedenê û berê jî tawana te bi tereye ,
Lê bê dengbe ,keÇê ji tere baştire ,ji tere
Bibe pisîkek mê ,hemû lit e wê bicivin ,
Bê dengbe lê ,Berdewamin di kolana ne bûre ,
Nejî here û nejî were ,Perîşanbe lê ,nekene,bê zarbe,
Pepokê ,û berê tu pepoke,xwe zîrek neke li pêşiya
"Nêr" ew jêreye ,xasî jêreye ,
Tu keÇe şermbike ji xwe tawanê te bi
Tereye mîna torikê qereÇiyê hilgigtiye ,
Xwe xweşik neke û bike ,da tu kes te nebîne ,
Xwe dorpêÇbike ,û
Xwe dorpêÇ neke carna divêt xweşik be ,
Porê xwe bişkine ,û carna ebûr be
Berde ,bernede ,Bike û neke

Lê rebenê ,kengiye ew bik û nek ,
Dive tu bibe di rêza xwda û ramananan sazbike ,
Geh li gorî gorê ,xwe şake ,dev li kenbe ,
Xwe vezilîne ,qesen avane,
De were rebenê ,bipeyîve ,
Tu dizanî ?matu Çi zanî piştî Çend û Çend xwendinan ,
Ma tu zanî ?
Û cardî dipeyîvin di avabûna şaran û hotêlan ,
Şabaş ji "civilization ê re ", şaristaniyê re ,
Sed bedaxewe,Aferîn ji ramanê kevneperitan re ,
Ez gorî we  û şaristaniya we ,şaşdimînim bi cadobaziya we,
Sey û matmayî mame,

Şaş mame digerim ,di kîjan demê de dijîm ,
Prî kamprî ,heyamê ……..,
Dinasin hûn cênoseyda kesayetiyê ,
Di kîjan gerî peyda dibe ,
Di heyamê diktatoran ,kujkerê civak û psykolojiya mirov ,
Bi wan hatin bi nav nîşankirin û helkewte  dîrokê ,
We li ber dadgehan rawestin,kujkerê giyanê jinan,
Wê roja wî bê û tê ,
Mîna îro "Sedam", Wê kurdên HlebÇe ,şanîbikin
Û tawanê enfalên bê soc,yên bi saxî hatin,
Binaxkirin,û dîsa bo nave olê li wan kir ,
Ey ejdehar ê sitemkar,xwîn xwerê nifşên  kurdan ,
Ma wê bi ser hiş xweve kari vegerin,
Te bê "ALkol" vexwarin , sermestkirin ,tar û markirin,
Te kuştin kire kar û maf ,wan dikuje û ew serkeftîne,
Bi nav û denge geynoseydên laş û giyanê mirovan ,
Geh bi şewata laş geh jî ,sohtina damaran Û hestan
Û cudanabin ,mirina psykolojîk ,

Gelo ,maf têne windakirin?
Bawernakim yên xwedî doz û armanc,
DIMIRIN,ûdi NEMIRIYÊ de dijîn .

-4-

# Hebû tunebû ,

Helbesta dema min di sala 2005

Mamostek zîrek hebû,
Hilgirtibû ,
Derdên rastên çep Û ,
Çepên rast ,ew jî tawanê wê bû ,
Tevlî tawanê jîrbûnê bû,
Ta ew jî kirin penabera peyva kor û dirêj ,
HELBESTVAN bû ,
Hilgirti bû ,
Ew tawana herî giring û mezin ,
Her Çax Û demê bi gunehbû ,
Dihat naskirin ,ji hev derdixist ,socê xwe ,
Bi paspora xwere hiltanî ,
Di her ÇÛnekê Û hatinekê ,
Bi penaberî jiyan dibûrandin,
HER dem jî mêvanê goré dibû ,
Bi vê xwe bi deyaxdikir bû ,
Venakişe tucar ji RASTIYê ,
Mane helbestvane ,zîreke ,

Ev ne hastén  di pirtûkan xwendibûn ,
Ne hastén Vîktor Hîgo ,

An Pol elyar ,
An jî Jak Prêvêr ,
Ji rojava bi me didin xwendin ,
Nejî bi carekêre Wergirandin ,
Lê ,bi tenê jiyane rasteqÎne ,
Jiyana keçek helbestvane ,
Hevala derd û kulaye ,
Derdê dûriyê hinkirim rondikan ,
Ta  Çav jî bûn kanî ,
Ta bûm hevala pelên keçîndar ,



## helbesta dema min

bi wêjeyên  berberojê
nemirî di bêdengiyekê
û  bê pariyeke kûrdeye
ji zimanê dê
li ser maseke nemirî,vejîne,
ferhenga wergirandina zimanê dê ,
masek xemilandiye,
bi awazên zimanê dê,
vejîne,avjeniyê de ,
li bin rodankek vekirî
li ser çarkinarkên şînahiyê
tevlî hevin gulên Ecemcekê,
bê fêl bazin bê xinizî,
bi berberojê re payedarin dilsozin,
bi rûmetin,
hevalin bê tirsin,bi awazin .
didin sema bi şitlên kolonya re diaxivin
her hênkaya êvarên tîrmehan
bînên xweş diweşînin,
lê mixabin,dil  û hinav bi wan şa nabin

dûrî bajarê evinê xemgîne,
Qamişlo bajarê hebûn û nebûna
çerxa feleka min.

..................]
Di malpera www.Efrin.net hatiye
weshandin 22/6/2006

-6-

## Berberoja min ,

Hevalên dema mine ,
EcemÇekên hemû rengan,
Gula hîro ,di axa welatê min de ,
Çendî şêrîne hingivîne ,
Kenê Sidrokê ,Çirisandina wê ,
Berî barkirina min ,hatiye Çandin ,
Di hizir û bîra min de ,xwe pêldide ,
Berdewame ,oxir be peja şêrîn ,
Kulîlkên min,bi we bîn ferawanim ,
Di beyanyan ,pir şadikirim ,
Xwe dikirin bi rêz ,ecemÇekan ,
Navdarin,Di nêv Çar kinarkên lemên xwede ,
Oxir be ,Girkê leglegê , ne gunde nejî bajêre ,
Li ber xwe dide , her gav û demê ,
Da xwe bighîne rengê ,
Rastiyê ,BERBEROJÊ .

Sîdrokê : navê sîdra ,keÇa biÇûke .

Enahîta hemo
Girkê legê " Ew gundê min helbest lê nivîsî ji wan
gundên ku navên wan hatine guhertin

Li kurdistana rojava. Piraniya gundên kurdan bi dû navanne yek bi zimanê erebî û kurdî daku kesayetiya gundê kurdan ji ser wan hilînin û ji rengê xwe derkevin
. 5-8-2003

……………………-7-……………..

# Cejin ,

Min tu hêla belê ne ji dil ,
Ji neçarî ,bê vîn ,

Ji buhuşta min ,
Ji te bê parim ,Qamişloka min ,
Sedema hebûna min ,
Dengê min ,
Li te digerim ,
Dildarek kevnarim ,
Mîna yarekê ,lit e dizîvirim ,
Mîna hizir û bîr bûye cegerê min,
Di hinavê min deye ,di destnûsên ,
FEREWAN de ,bawkim ,bi tere dijîm ,
Bi bînên tere ,Pênûs ,îşev ranazê ,bê xewim ,
Bi hestên xamê ,îro dizanim ,
Îro ,roja bîranîna helbestvane ,
CEGERXWÎNE,
Di sirek payîzî de,oxir ji me tevan xwest ,
Tevlî barê xwe hilgirt, bixÇika xwe ,
Îro va dîsa hogirên helbestê ,her sal dicivin ,
Dildarin kevnarin ,
Dicivin di ahenga Çûna te ,emegdarin ,
Dilsozin ,
Mixabin ,îro ,dinalim
,ji derdê dûriyê .
Dûrî bajarê evîna welat .

Şam ,li paytextê hatiye nîvisandin.

-8-

# Ez nema ji te hezdikim ,

Nema ji tere dinvîsim ,
Ji te hezdikim .
Zê binvîsim ,
EZ bêrîya te dikim ,

Her dem ê ,
Her çaxê ,
Di hemû liven min deye ,
Di ramanên minde ,
Tu bi min reye ,
Dimîne ,
Ez ciha
Şaristana
Dugherim ,
Her tu dimînî ,
Her dem ,
Li hemû ciha ,
Her tu dimînî ,
Li her deverê ,
Li pey minî ,
Bi min reye ,
Di rananê mindeye,

Û her û her ez bêrîya tedikim ,

Nema ,nema bi carekê re ,
Ez ji tere dinvîsim :
Ez ez ji te hezdikim ,
Ez nema ji te hezdikim ,

Nema bi ter diaxivim ,yek bêrîkfonê ,
Nema dib1jim :bi mib re biaxiv carna ,
Nema dibêjim : te bêrîyamin dike,
Û kiribû ,
Û hêjî nema dibêjim : tê bêrîya min bike ,
Awaz1n tengê te ,
Nema min dihejînin ,
Êdî bêrîya te nakim ,
Nema bi yek care têlêfon dikim ,
Ez nema ji te hezdikim ,
Lê ,belê gulek diÇilmisim bê te ,
Ji dorbûna ,
Ji bêrîkirinê ,

Ez ……….nema……………..,
Dêrik Avdar 2605
Anahîta hemo
-9-

# Mirov

Rojek ji azadiyê ,li ser axa ,
Kurdistanê , dikare laş û hinavê ,Mirov ,
Demanbike û hemû êş û azarên wî derîne ,
Toza salên dagîrkirinê wî
dawşîne,
Û xweş xiniziya mirovên ji poş seredê,

Hijmekarim bi lehengên wê azadiyê ,
Alê xweş hildide ,û pê jî sûndê dide ,
Xinizî xwe poç dibîne ,
Wê xweş peyamên lehengan wergirtine ,
Ji ezber ,dibistanek ,serbixwene ,AZANE ,
Dibistan jiyana mirovên rasteqîniye ,
Afrendiyrdike ,bi hemû rengên gulên xwe ,
Vedane ,xweş diyare ,
Lehengî û ezezî ,ji hev derdikeve,
Ji hev xuyaye .Mirovin,Mirovin ,
Mervanin,lehengên demê ne ,
27-9-2004
Helbestvan Enahîta Hemo

Gurzek

# Gurzek

Li himber gulê ,
Bejin tê nasîn ,
Dema gul dibe neynika min .
Xwe baş têde dibînim ,
Xweşik an reşik im ,
Li himber dadgehan hinavan ,
Zêrim an jî zîvin,
Dolemendê giyane ,
An jî perîşane ,
Gurzek gule ,mîna
perÇê ximava RORşax e,*
Gurzek gul xweş dinase ,
Mirov bi nav û deng bike ,
Enahîta Hemo
* Zanyarek psykolog e.

# Gundîme

Gundîme ,yabo,hêjî bi giyanê te sûndxum,
Emegdara,ramanên teme ,
Zû bi zû ji ser wê rêÇê  venakiŞim
narim ,Dilsoza gora teme ,
Bi min re dijî ,ne tenê me ,
Piştî heft sal iya ,oxir xestina te ,
Mîna kesên dilsoz hêjî di beyabana dikim hawar,
Div ê rojhilata kevnar,
Mîna hemû kesên rojhilat ,pir diaxivim ,
Ji jiyanê HEZDIKIM, bi dengê bilind diazivim ,
Bangan bi bontan bawernakim ,
Bi derewînan ,xwedî bercewendîne ,
Sofî ne ne marksîne ,
Xwedî sloganin vala ne ,
Pê nanê xwe dixun , Na ,nabim ,gorî derewînan,
Gemarin xwedî rîyên dirêjin ,
Bo xapandinê , Bi giyanê te bawerim ,
Eve raste, bi rastiya te,mîna berberojê ,
Têm dest û Çavên te ,
Bo min rizgarbike ,ji vê civaka kevnepereste,
Da xweş bijîm û bistirêm ,
Dîlokên te ,folklorên te ,dengbêjîya te,

" SEWDALIYÊ, KEÇika Simoqî ",
Sibe jê dixwazin bibe keÇika spor ,
Bo daxwaziyên herî erzan ,ji bercewendiyên teybet,
Belam sibe wê bibe qunÇikên Çixaran ",
Poşê seradê ,
Gundîme,
Na , Na ,ji vexwarina Çixara dîmenê şaristaniyê ,
Na ,Na ,ji qehwa serê sibê li xurînî ,dîmena şaristaniyê ,

Gundîme ,yabo ,
Ji kaniyên dilêran vedixum ,bi rûmetim li ser zimanê dê ,
Emegdara mûmên teme ,
Di pencerên axînî ,li bajarê evînê ,Demên nûrojê ,
Ne bajarî me , nabim şamî na,
Bi Arezûyên xwere dijîm ,
Bi vînim , Dilvîna xwestekê xweme ,
Hêjî paşketîme ,dilsoza hewara xweme ,
Jîndarim ,vejînim ,bi hînbûna ,
Zimanê dê ,Dilsoza ramanê xweme ,
Ez vê role dilîzim li ser textê vê şano ya cîhanî ,
Bi sirûşta di bîra xwede demên xwedibûrînim ,
Bi hest û helbestan re dijîm ,
Guhdara kul û derdê doza xweme ,
Li ser şopa derbê di beştê mala axîn ,
Di ahengên cejna nerojê,
Ji taxa windayî li ser nexşên cîhanî ,
Me dil jî avêt ,kaniyên" KAWîs,Çaroxî ,cizrawî,
Berwarî,û Çend û Çendê caran tu di kesera wan dema û ma
Bê tu şahiyê bibîne ,dib ê sociyê de ,
Mîna zarokekî hêvîdar ,
Gundîme ,yabo ,
Bi rondikên xwere me ,
Bi liva xwere me ,
Dîsa ,yabo ,Dijîm bi hunera nifşên xwere,
Bi gulên welatê xwe re,
xwe tînim ziman
Bînê diweşînim ,
Gulên nûjen dibînim,
Wê vegere ,welat bi serê te ,
Bi her Çar kinarkên xwere ,
Mane Gula teye ,

Wê

vegere ,
GULA te ,
EVE raste ,
Bi rondikan
Wê vejînbe ,
Her demsalan ,
Nabim gunehkara gula te ,
Hêjî bîna wê li ber pozê meye.
Dildarim ,mîn rûyê zarokekî ,
Mîna buharê ,
Min hevjenî bi rastiyê re kiriye ,
Pir ji jiyanê hezdikim ,
Eve raste,
Eve raste gundîme ,
YABO.
Hezkirin û bihar ji hevin mina Çermê
Zarokan nerme .
Gundîme ,bawermendim bi xwedê
Tevlî ku pir kes bi min dikenin
Bo vê yekê ,
Hêjî gundîme .
Ez dîna hevaltiyê û malbatê me
Eve raste.
Dîna rastiyê me ,
Me bi hevre ,soz û civan daye ,ta pira
nimêjê ,
9-11-2003 şam


# Bavê min

-Vaye ,"yabo",bi leze,
Ji kart ê ,dildare,
Hezkerê zarokên xwe ye,
Bi misk bîna xwêdana xwe,
Û dest jî bînên beybûna ,kare,
Pîroze xunave,xwêdane,

Rûbare,Çend pir û buhur ,
Bûrandine ,Ling jî qelaştiye ,
Li dûv daxwaza nasnamak kurde,
Bi doze ,bi hemû cergan,
Ji serê kiriye hirî ta lingên qelaştî,

-Destê rastê mêwe hilgirtiye,
Bi destê Çepê şînahiya dilê wî ye ,
Rûpîroziya pêşerojê ye,
Bi wî diranê rengê zîv ,
Zeredekene,asîv dida Çavên me,

Jiyana me dixemile,
di wê rojhilata xav de,
Bi hezkirina xwendinê ,
Eve peyama "yabo'
Hezker û hevjînê  rastiyê

PêŞeroja jiyana meye," yabo",
Kêlîkên me vala nemane,bê şahî
bi şahî,Vane ,xuŞk xwe pêldidindidin sema,
Her wiha jî bira yê biÇûkdibeze,
Li pêşwaziya te,heÇê berê gula zerê,
Wî ramîse ji aniyê ji hunarkên rûyan ji bêvilê ,
Naweste ji kenên şahiyê ,

Wê kî gorê rastê jêbixe ,
Wê kî gore Çepê jê deyîne ,
Bavê mine ,westiyaye,
Kolan bi kolan li dûv nasnama meye,
Ji şahiyê naweste di nêv jana de
Berdewame,bawermende,
Mijûlin zarok bi şiştina qeresî,
Di ber avjeniya xwede,mehên " xermanan",
Gelawêjin tîmehin,
Havîne,ji gema têrnabin ji avê,
Li nik darên "Lêmo" û gulan ,gulîstana malê ,

Mixabin,mîna Çirûskek lewend,
Tîrejek bezî,şahî ,livek sivike,
Kurte demek şêrîne,

Îro ,em bi tevaya xwe,
Gorî giyanê zû mîna Çûkekî firinde,
Firî zor ciwane,zemîn lime kir buhuşt ,
Bi bîranînên giranbiha,payedare,

Ji nêv me barkir ,
Hêja ye bavek şêrîne,
Êdî piyala zaroktiya me,dagirtiye,
Ji lîstokanji şahiyê,
Denbêjek guhdeze,
Bi bîranînên tere dijim ez,her kêlîkê,
Te mişt hişt dema min ,
Xwestekên te bi cih tînim ,
Berdewamim,Bi awazên te jiyan berdewame,
Emegdar,dilsoza Arezûyên teme,

Dojehên bajarê biÇûk ,
Bi têbîrên tere,dibin havîngehên bajarên ronahiyê "
parîsê ,
"şanzilîzê", strasbûrg" di hemû katjimêrên xwe,
Dilsoza dildariya teme,
Ji wî temenê herî biÇûk ,
Eve ,raste,ji minaliyê ,
Mirov matmayî dimîne li wî bajarê windayî
Li baweriyên başqe ser bixwe li wê ola " yabo ji bingeha
Mirovayetiyê ",
Li mirovayetiya"yabo " şaş diman li wê tara
Bajarê biÇûk,li goranênên te,
Li kalînadengê şoreşa kalê
Nemir,Miriyê mirovayetiyê ye,
Guhdarê "dengê kurdistane",
Meyaye êdî di hizir û bîra hemû beşên
Mejû de ,peyama kurdayetiyate,
Bi wan kurdên te hilgirtên "AVESTA".

Li baweriya te " yabo" ,
Digotin,mîna her carê berê ,û
Dibêjin Hêjî :" xewne kurdistana te ,
14-8-2006-Qamişlo

# Dil soza sûrişta teme ,

çiyayê
Berwarê ,
Dildarek kevnare,
Emegdare,

Hijmekara teme,gundê
Hirorê ,ji bilî ava kanîyên te,
Welato,hîç zemzem nîne,
Xwe xûzdikim bo te ,
Bo ramîsanek ,nemirî,
Serdemî,bo axa pîrozkirî,
Bo destnimêjeke heîynî ,
Li şarêRANYE,birîndare,
Rojek ji jiyanî ,li ser xaka buhiŞtî,
Li himber hezar rojên buhiŞta `,
Pêximberên ,peyamên berê ,
Ji bilî lavijan zê Çi biwergirînim ,
Ji Êş û Azarên mirovên pêrgî wan
Bûm,gelo, 15 salên zindanê,
Û çend û çend salên pêŞmergayetî ,û
Çend 7 salên êşkencên,
Diktatoran,
Neb ê Çare ,bo mirov binase ,
Çêz  û xenda zemîna rizgarkirî ,
Ji wan mirovan ,
Mirovtir hîç derbasnebûne ,
Li ser dîmenên hizir û bîrên ,
Ew xweŞ dibhîzin,Sazdikin,
Kalîna Qamişlo,
Nalîna Amed,
Fîxanên Mehabad,
Kewan xweş didin przûkirin ,

Ji lehengane,ji ezberkirine ,
PEYAMA, xwe ,
Êş û AZARên me ,
Dimînin ,hevalno ,ew derûnên
pak,bi ola kevnarên xwe, kalê
NEMIR,
Ji çend û çend Pakrewanan.

-13-

Tîrmeha QamiŞlo ,

Di kelkele gema havînê de ,
Malbatek di bin siya dareke
sitor, kevnar hênik
havîngehekê dibûrînin,
Tîrêjên revyayî di nêv Şaxan û pelan ,dene
Çavan didin girtin,
Ji germê reviyane,
Xwe li nimdariyê digrin,
Ronakê di hêlanê deye ,biçûke ,
Laqirdiyandike,geh jî dikene,
Hêlan jî girêdaye bi darê ve ,ji benaye ,
Di nêv Şax û pelên kesk de ,xwe pêldidin,
Pel bi pel bi Şahiya zarokan ,
Mijûlin ,geh bi goranên zimanê dê ,

Geh jî zimanê zordariyê ,
Jiyan jî lîstoka waye ,

PiŞtî nîvrojê ye ,
Li hawîr dora masêne ,
Piyalan dijmêrin ,
Tevlî pisîkek guh dîke ,
Li ser dîwêr ,Çavdêra kevoka kedîye ,
Dîkê kimÇik sor dibeze ,
Li dûv mirîşkêye ,
Amedeye bo navcîkirinêye ,
Di bin dara têr xelek ,bi rehên kevnare,
Dîroka xwe diyar dike
Dara tiwê , gelo vê mala kirê Çend
Penaber hejandine ,
Di vê nimdariyê de,
Çend zarok razandinedi landikên xwe,
Parastine ji kel û girî ,melûlî hişyarkirine,
Dîsa di bin vê dare de,
Ji mêj rehên xwe berdane ,
Û bê rawestan berdide,
Berdewame
Li ber jor ,şaxbilindkirine,
Guhdare li awazêm sirûdên,
qazî mazî ,
Mîna ,Ronîda xwe sipartîye ,
Synfonîyên ,Çûkan ,

Li bin sîberan.
Dîmenek heydare ,
piŞtî firavînê,Şil û pile ,
MirîŞk li ser motka xwe ye ,
Rodî bendeware ,bi arezû ye ,
Dîk kela nave dertîne ,
Axê vedpexirîne,
Rodî xweŞ xuşkê bihejîne ,
Di hêlana xuristê de,
Dema wê pîroze Azaye ,
Iro ,mîna her sal vegera cejna weye,
"Pîrozbe", li we minalên cîhanê ,
Iro, dema weye,
Hemû zarokên li ahengên cîhanê ,
Bikenin ,gorî weme ,
Bikenin ,
Fêstîvalan li darxin,
Bijî jiyan û demên
ZAROKTIYÊ,
Hênik bikin SEQA ,xwe,
Bi sîk û Sîber
Li nik germa bajarê
qamişloka xemgînê,
Pîrozîya cejnê diweŞîne ,
Xwe bihejînin ,bidin sema ,
Dem û dewrana weye ,
Bi sirûdên ,

ZIMANÊ DÊ .

Enahîta Hemo

--14—

# Rivîn Rinde ,Lewende,

Bi Şeh û neynika min ,mijûle ,
Her çax û demê ,pê gezo ye ,
Rahiştina tiştê min ,germa
tîrmehan ,berfdikeli me,
dem û
Çaxên min ,çiraxin,
,mîna berfa
mûŞ û serheda,hênik dike ,
Li bajarê windayî ji nexŞên,cîhanê

,ji şînkayî re ,
Diaxive ,vejîntire,
ji meyweyên ,
Dêliyên Çiyayê BERWARÊ,
GeŞtire,

Rivîne xwîn jî hingivîne ,
Gulek mîna şîlana kurdistane,
Berberoje,
ji her Çarkinarkên ,
Gulîstana  mal û malbatê ye ,
Çimkî zîreke ,bi live,
Bi Çalakiyên ron ,şêrîne ,
Di nêv pel ûÇentê ,
milê min bê rawestan di xebite ,
bi şêranî peyva " Metê " ,
DiweŞîne ,li nêv hev dide ,
Gotar û helbestên min ,
Destnûsên min

Levdayî ye pêdikeve ,
Hemû qeşmeriyên ,bajarê,
Qamişlo ,di dibistana destpêkî de ,
Bê pare ji zimanê xwe ,
Zimanê zikmakî

Meste , guh jî mişt e,
Ji AREZÛYAN,
Li hêviya Çîrokek zaroktî ,
wergirandî
bi zimznê DÊ
Ji " Alîs di welatê seyrê de",
pir hezdike",dildare
Bi", Çixat firoşa biÇûk " re pir ,
Xemgîn dibe ,
Xweş dîliya ," Sipîbûna berfê",
ji şabanû ya efsûnbaz ,
Hîndibe ,jê fêr dibe helewîstên ,
Jiyanê ,li dibistana mala
kalkê xwe,
Bê têr bûn Guhdarî li min dike ,
Xweda , wê bihêle , zaroke ,
Bê soc û gunehe,ji xeşîmtiya ,
Mezinan,ma ne deme ,bo jiyane
Zaroktî
Wê biparêze ,ji livên tewŞ,dema

Kevneperestiyê ,Çimî keÇike ,
Xweda ,wê bê parneke ,
9 salî ye ,di  digulîstana bêpariya ,
zaroktiya zarokên kurdistanê .

Welatê bê nexşe.li ser rûkê zemînê ,
Di nemiriyekê de dijî bê hedane.

Enahîta Hemo

-15-

NebirÇîme ,nejî tîme ,

Ne tazî me ,
Ne sêwî me ,ne perîşane,
Lê ,zaroke , bê par maye ,
Dikim nakim ,ez têrnabim ,
Têr venaxum ,bê pare zimanê dê ,
Bîr valaye ,tîn naşikê ,
Belê , birÇiyê zaravên xweme,
Bîn diÇike , bi helk helkim ,
Tenê mamê mame ,sêwî mame ,
Div ê jînê ,
Bê pare zimnê xweme ,
Neb ê malim ,xwedî zêrim
,pê naxemilim ,
Mixabin ,îro, bê zaravim ,
Di hizir û hiş bîra xwede ,
Tenê sêwî div ê jînê ,
Bi vî rengî dibûrînim ,jiyana
Rawestîyayî ,bê şahiyek ,

Di teqinim di tariya şev
Typên kurdî ,bê nivîsim ,mame ,

………Enahita hemo

16----

Pîrozbahî ,

Diyarî rojnemevan : Mes,ûd Hamid
Rondik vê êvarê nawestin ji herikandinê ,
Ey lehengê karê xwe ,te sê sal ji gula temen kir ,
Qurbana wênek zarokan,
Rondik rûbarin ji dil şame ez,Bînên teng ji cerg û hinavan ,
Vedike,Bi wênak zarokên bê nasname ,
Te hilgirtin ew nîşanên ,
Gewre,Çimkî tu kurdî te xwe negirtî ,li himber ,
Bê gunehiya zarokên bê maf ,te kirin tawanê herî giran,
Bi deronek pak,tub û leheng di nêv xwendevanên dema xwe,
Bê war te bûrandin roj û kêlîk ,hejmartin talî ,
Hejmartin êş û nexwşî,
Bêwarê gelê xwe tu dima bi tenê di wê zindana sar ,
Ta lit e civiyan ew kul derd û êş,
Ez jî xemgîna wean tebûm di malpera me Rojava",
Keserk diû yek jî dibûrand û daqurtand ,
Va ye ew roj hat ,bi AZA bûna te ,
Çûkû firinde ji dilan te firand,
Ji pencên hovan ,min bawernedikir, rizgariya te,
Piştî pakrewanê kurd êdî nema înan bi dezgehan,
Tu serkeftî ma ,ew bûndizê tawanên xwe,
Binerin li wan ta kengî hovbin ,û dimînin ,Roj,
Ji roja dîtir bi wî kenên zer tê belû kirin êdî kifşe ,
Lîstokên wan ,himber hovîtiyê bi cegerek rûn te mafê xwe kir,
Bi zanistî ,te kirin tawanê welatê par par.
Anahîta Hemo

--------------

---17-----

Yadê

Ma qey biyanî dikare,
Dengê lavij  û destnimên te ,

Derîne tevlî baweriyên te ,
Ji hinavên zaroktiya min bi tere ,
Dengê te qube û bilindtir dibe ,
Dibhîzim  di giyanê min de maye ,
Pîrozin liven te ,nazenîne ,peyva ,yadê ,
Çendî şêrîne ,pîroztirîn jê nîne ,
AVA dilop dilop tê ji zend û bendên destnimêjê ,
Bi min reye vaye dengê te dikim ,barbenge ,
Vedgere, dîsa dizîvire ,
Xwe dughere dîsa li min vedgere,
Hemû ziman lalin ,bi hemû typan ,
Dayê ,yadê ,MAMA ,MAMÎTO ,
Pesindariyê vê spêdê sûndixum bi navê te ,
Bi wan ayatên ji ezberkirî ,wî rûyê te hingivîndike ,
Ji dema spêdê destpêka liva mine ,

Beyanî baŞ ,Roj baş spêde baŞ,diya min,
mane tu diya mine ,
Bi rondikên germ ,û kelek bê rawestan ,
Mîna kelkela bûyerên  bajarê min ,
Ji vê dem û Çaxên ji AR ,
Bi pênûsa min reye ,dinvîse ,
bi hemû şanên xwe ,
Dest berjorim bo hebûna
zelalbûna dengê te ,
Li ser darê jînê ,
,keftlefta ,temenê te ,
Bimîne ji mere ,Livên ,
Bi lavijan re ,
Destnimêjgirtinên te,Dilpake ,dayê ,
Bi hiş û hizir û bîre ,
Ji bîr nake kar û barên xwe ,
5-10-2003 ………Enahîta Hemo

# Bo çî berzanyan?

**Çima gundê berzan**
**Da bû dilê wî hovî**
**Xunmijê kurdan?**
**Çima berzanyan?**
**Ne mîna hemû kurdan**
**Hatin veşartin?**
**Ho!!!Enfalno,bê gunehno,**
**Perîşanên biyabanên**
**Penaberiyê,dil sozên kurdayetiyê,**
**Ji çiyayên berzan ta biyaban**
**Bûn qurbanên azadiya Kurdistan,**
**Ax!û sed Ax !çendî hêstir bûne lehî**
**Li ser termên,ji hestiyan,**
**Tabûtên mejû ,mirovayetî**
**BAWERNAKE,BAWERNAKE,**
**Xweda!Ma ne namûsa mirovin**
**Heşt hezar berzaniyan?**
**Bê hişim ,îro,roja pêşwazîkirina**
**Rondik na rawestin,nejî diçikin,**
**Ber dîmenên,nemirî,ji dîroka durdan,**
**Pîroztirîn ji wan termên enfalkirî,nebûrîne**
**Di dîroka didîroka faşistên cîhan,**
**Ma geko,hêrandin,û dêranina**
**Hestiyên wê rêjîmê,çiye himberî**
**Kul û derdên nemirî**
**Çi dayik,û jinên,bi hêstirên**
**Pîst û sê salan,çav jî bûn kanî,**
**Pîroze berzan,ew gundê şoreşê,**
**Pîrozin,cil û bergên pêşmergan,**
**Pê hatin nasîn ,ew tawanên,**
**Faşistên kîmawî,bi wê cemedanê,**
**Kurd dane nasîn,êdî kes maye,**

**Kurdan nasnake,bi wê lez û beza**
**Berzanê NEMIR ,li ser wan kaşan û**
**Newalan diherike îro giyanê**
**Nemirê kurd ,bûye Mînakek ,**
**Mîna giyanê xezalan hildikşe çiya**
**Li dûv xwe dihêle xêr û bêra jînê**
**Da dûv nemiriyê,xak jî pîrozkir,**
**Dîroka kurdan,berzaniyên NEMIR,**
**Bi xwîn,we kir î  xaka meyî pîroz**
**Ta vejîn kirin keyser û rêber,**
**Ta bûn serokê,kurdistana payedar,**
**B I we bawerim,we kurd parastin,**
**Bi we bawerim ,dîroka kurdan**
**Qirkirina we bo navnîşana me!!!**
**Mirina civakî,bûye,teybete,bi gelê me,**
**Mirna tebayî cendî pîroze,Gênosîd,**
**Bi Asîd û xerdel ,em bûn milletek cîhanî ,**
**Mondiyal ,bi D3l û perîşaniya me hişyar bûn,**
**Tirb û gorên berzaniyên nemirin,**
**Didin nav nîşana melyonên windakirî**
**Nayên bawerkirin,ji bilî girî**
**Zê çikim diyarî,dilsoza weme,**
**Dilsoza weme ,kurdên ,DERÛNPAK,**
**Bi rûmet ,dijî mirinê,**
**Mê bijîn hevalno,**
**Di nemiriyeke kûr de,**
**Bo zar û nifşên nû,ew omîdin,**
**Bo pêşerojê,Dilsoza we me,**
**Îro şiyarê doza xwene,**
**Li hêviya dadgeha**
**diktator,**
**Îro roja pêşwaziya**
**vepexirandina**
**Gorên bê sociyên ,pakrewanên**
**Enfalan,Li we xwedîne,**
**we dane pêçan**
**Bi pîroztirîn  ALA RENGîN,**

**we bo me Hilda**
**Û dîsa zar û zêçên we**
**bi wê bi xwe pêça**
**Vaye perîya we enfalan,dîsa**
**Vejîne,ji derya tê der,**
**piştî xewa dîliyê**
**Periyek nûjen,bi xemla dîrokê,**
**BERZAN,dinale,dike ,hewar,**
**Dide qîr,dictator**
**çûn,kanî zarên min????**
**Bo em bijîn çend**
**ê rojên pêşeroj**
**Mixabin ; deng li wa vedgere,**
**Bi giyanê firiştî gihane xweda,**
**Bîranîn jî man pêçayî bi ala**
**Birîn,kul,keser,ferhenga**
**Xemgîniyê êdî nikare,**
**di singa xwede**
**Wan bicivîne,**
**Xwe spartin**
**xweda,,wek heviya asîmanî,**
**û dîsa didin cîhan**
**bihuşta,Rojhilat,**
**Ew e Kurdistan    vaye vegerye**
**bûye mînakek,ji**
**Dana xweda,çendî**
**dem bûrîn,**
**Lê,neyên ji bîrkirin,di hizir û bîran,**
**Çîrok û dîroka,kurdên perîşan,**
**Sûnda min bi we,bi wan dîliyan,**

**Kurdên bi rûmet,**
**bi ola pakrewan,**
**Maye bê tîn**
**Tîn jî naşikê,di bihuşta cîhan**
**Hatine belavkirin ew berzaniyan**
**Penaberên,xemlû xêza jiyanê,**

**Bê parin,bê parin,bê parin**
**Çima BERZANYAN?**
**Pîrozin bi ola kalêxwere dijîn**
**NEMIRIN,Bijîn,bijîn,dîroka**
**KURDAN.**
**17-10-2005 –Qamişlo-**
**" Bajarê Evinê**

**----19-----**

Pêkarîbûn

Zûkin zûkin zarokno,bi civîninlehengan,
Bi hevre,çêkin gulîstana lawiran,

Vaye şêrê qerbelek,deynin rêza pêşiyan,
Şêr jî bi tevye xwe amedeye ,ji mêj bo mamosteyê xwe ,

Bêjin ,bêjin ,zarokno,kî bi zimanê wan zanî ,
Zana, ew pêximber Silêmanî,

Lavijan ,vegerînin,goranan,li bajarê Moristan,
Kî bi hevre civiyan kurkirin,şêrê qerbelek?

Cana vegerand, belê ewin morî bi hemû Çalakiyan.

Paşê hûn dizanin –Hûn?Li Çiyayê Sîpanê xelatê
Li kurdistana pîroz,peza pez kuvî Çikir?

De bersivê bide Dilgeş can,belê piçûkê şêrînan?
Belê xweş emdizanin – û tevan bi hevre gotin:

Ew peza pîr quloç,destê Siyamen ji xecêkir ,
Destê Bûkê ji zavê kir,bi herifandina sîyamend

Wiha dapîra me ji mere dihona çîrok,ji gotinên pêşiyan,
Ji gulîstana binemal1n me kurdan,me "Beyt" ,ji ezber kirin,

Zûkin ,zûkin bi berheman,û Bersivan,
Ji mere binûşin şêraniyan,

Fîl çawa xwe dişo ,Dizanin- Hûn?
Bi wî bozê xweyî dirêj û avjeniyê dikin

Li ser peravan,deryan û çeman,
Wiha jî di bin daran ,li daristan,

Dengê şado me nekiriye ,ji mêj ,heydare,Kîso zarên
Xwe çawa diparêzin?

Belê ,em bersivê bilin dizanin,…..mamost…e
Başe ,deh li ser dehan ,…Aferîn ,

Başe berkewta bo îro ,Amedebin,
Bo spêdê ,programên demên bên ,,bo dîrok ê,

Amedebin ,bo lawirên dijîn di pingavan,
Û peravan,vegerînin,zarokno ,navnîşanên,jiyanê,

Guhertine,ew pêkarîbûna demê û deveran,kêlîkan.
Pirsa herî dawî bo sibê ,bersive,Kê Kurdistan perçekir in?
Sibe berî şîrovekirina newçe û gêografîa welatê kurdistan??????
Anahîta Hemo

Payedar
Li ser perava herdû çavên payedar,
Minale ,Gunehe ,bêpare ,ji zimanê dê ,
Tenê div ê jînê ,pakrewane ,dijî
Seyrangehek,havîngehek ,nejîne,
Nazenîne, çiraxin xoşin,bextewerim,,şame,
Di herdû hinarkên rûyên wî aso min dibin ,
Welatê gulîn ,dil bi dilê lavlavkê cîhangîrdibim ,
Ji mêwê kurdaxlê çêrîntire ,ji zeytûnênên " Efrînê "
Bi tamtire ,ji çêza zemîna pirrşîn ,lewentire ,
Ew gundê windayî ,bê nav nîşanin gelê wê ,
Ji tu nasnameyê cîhanê ,ji kurdan ,
Lê ,li wir havîngeh serbixweye ,AZAYE.
Anahita Hemo

---20---------

HelebÇE
Ranye, xormale,Amede,Qamişloke şêrîne,Mehabade,
Berzane,laleşa kurdaye,

Di her helbestek wergirandî, vemiztdibe,qeymaxeke,
Nîvişkeke gundî, bi ser dewê wê dikeve,
Lê ,bandore nîvişkê helbesta HelebÇE,
qeymaxekeke, hizreke,kurmanciye,resene ,ji binemalek kevnare,
Azaye,teybete ,serbixweyebi cênoseyda geleke bê sûce,
De werin giyanê kalan,û jinan,şîrmijan,
di hijdemîn salvegera te de ,HELEBCE,û ENFAL,
"HEBESTA HELEBÇE pêşwazî we dike ,
DE werin perpirsên mafên mirovan wî li ber dadgehê ,
Bi mafbikin ,Ji kêmanî 182000 êş û AZAR di laşê min de

Divegerîne,diwergirîne,
keÇek kurdim ne kêm bejin û balla me ,
tenê bi tenê xwedî dozim rojhilatîme tême ,
Qirkirin ji culturê,ji zimanê zikmakî ,Hêjî gênoseyda min li dare ,
bê nasname,di laşê min ,diçirise ,
bînên sîrên şîmîk ,û xerdel,û hêjî "SEDAM" bê tawane,bi wî şûr1 islamê
Weyî li minê,Genîbûn li hawîr dora meye,
Civake rojhilate,bê zanîne,anelphbêtîkek kurdî bi haware
Bi alaxên paşmayî tême sohtin,çewisandin,
Bê sûdeye ,jinek kurde ,bê mafê bê kesayetiye ,
Diteqine ,di yasên prî kamprî ,bi destnimêja dapîrê,
Xwe bi mafdike ,bi deyaxdike,
Xwe bi gor dike her 5 deman mirinê tîne bîra xwe ,
Û ew jî di gorê de qesena ji xwer avedike ,
Û li gora wê mawe tên afrandiyarkirin,
Alaxên gerên paşmayî ,wê dorpêçdike ,
Ji wê werê xwe dighîne firiştan bi berdana mafan û dozan,dibe gorî bira " Nêr" , ew pîroze di civakê ,
Ew sohtinek yekemîne ,wê keç bêt enfalkirin,
Da ko bira bijî ,div ê qiçînê de , tebaxe diktatorê
Afrandiyarê mirinê ,Amedeye ,
Fîlmên dîliyê li darin refên zarokan bi tilûran re
tevlî kalan xesma jinan ,
Bi gokên zarokên bê nafam,mîna keça kurd ,
Lê vaye payîzî rojek dayê bi veger ,ew germ şikest,
Pelên zerbûyî ji "Lêmo",li himber rodanka kevanar,
Ji wê hewşa têr pelên şîn ,hatin weşandin,
Ji Hezkera payîzê Helbestvana peyva xurt û kûr ,
Nimêjkera rastiyê ,penabera dema xwe ,şîlana Kurdistan,
Wiha dixwest yasên rojhilat " Mê dibe gorî nêr",
Eve ol û alaxên kultura kudên paşmayî ,
Dûrî şarên mirovayetiyê ,Ger jin bifire bi bask ber bi ezmên,
Yasên wê dijwarin dive mîna pisîkan û kitikan ,
Xwe vetirîne  li ber sîberek dara gula ger jêre peydebibe,
xwe kedîke,tengezara kesaye,
Bendewara nêçîra xweye ,bê tu nasnameye ,
Windaye ,ev jî gênseyde ,psykologîke ,
Berdewame,bi renge renge,têr be an perîşan be ,

Li sernserê kurdistane,ne tenê helebçe keserek taybete ,
Bendîxane westîne ,ji gênoseydên ciwan ,rizîne,
Li Amedê ,mehabadê ,Qamişloka serhildanê ,
Li çend û çend gorên cênoseyd tenişt gora pakrewanê,
kurd hatin aramkirin di nîv şevên bûyerên kuştiyên,
Serhildana ziman û kultura kurdî ,
Tenê bi tenê tawanê wan kurdbûn ,gulle li wan barandin,
Ne bi bîna sîrên genî nepixîn ,lê gênoseyd di bin yek
Rêjîmê deye ,yek Basse" ,yek diktatorê ,
Lehenge li ser bê Çekên kurdan hemwilatîne ,
şaristanîne, ,çav jî hitimkirin ji tirsê û lerzîn,

ling seqetkirin,Qurabanên "xazên şîmîk",
Atom,,HelebÇE pêşwazî wedike,
Bi hemû radeyan,û sînoran,Çi bi syanîd Çi jî
bi bînên genî ji laşên pîroz bîna mirovayetiyê diçikandin,
Wê kî bi min re wan arambike,raweste
li nêv wan katjimêrekê ,eve mîna termên cîhanî yê dûyemîne ,
Li her deverê Mirovayetî dinale ,
Bo hovîtiyî xwe venegre ,rawestin kêlîkê ,
li ser canê wan lê belê 5 kêlîkan gelê kurdistanê ,
îro rojên dadgehên Afrandiyarê Enfalan ,Helebce ye ,
Wê kî wan bi min re ARAMbike ,
Wan giyanên bê hejmartin,,bînên xweş diforînin ,
Pakrewanê doza xwene ,vane li ber dadgehê li hêviya
Rastiya li ser zemînê ,Rawestin bê gunehno ,Enfalno ,
Kurdên fîlî ,zerdeştîno,bê socno ,
We me bi nasnamekir ,di cîhande ,
Jine bîno ,şîrmijno,Gor we şanî gelan dikin
Dêw jî hêjî dijî div ê payîzê ,
Piştî hemû demsal kumkujî li dare ,
li kurdan herdem dojehe Senter û rêxistinên Helebce û enfal ,
Bi tenê dizanin bi hejmarên bê pare kes û binemalên xwe ,
jinebîyên xwe,Sêwiyên diktatorên dagîrên kurdistan,
bi Enfal û cênoseydên berdewamin.
Bê mafên kulturî
Kesayetî
bê
Nasname,
Û qedexekirin û qirkirina kurde îro,
Li rojava ,rojhilat ,kurdistansernser.
Enfalin ,HELEBÇENE.
Anahîta Hemo



# Ez nema ji te hezdikim ,

## Nema ji tere dinvîsim ,
## Ji te hezdikim .

Zê binvîsim ,
EZ bêrîya te dikim ,

Her dem ê ,
Her çaxê ,
Di hemû liven min deye ,
Di ramanên minde ,
Tu bi min reye ,
Dimîne ,
Ez ciha
Şaristana
Dugherim ,
Her tu dimînî ,
Her dem ,
Li hemû ciha ,
Her tu dimînî ,
Li her deverê ,
Li pey minî ,
Bi min reye ,
Di rananê mindeye,

Û her û her ez bêrîya tedikim ,

Nema ,nema bi
carekê re ,
Ez ji tere
dinvîsim :
Ez ez
ji te hezdikim ,

Ez nema ji te hezdikim ,

Nema bi ter diaxivim ,yek bêrîkfonê ,
Nema dib1jim :bi mib re biaxiv carna ,
Nema dibêjim : te bêrîyamin dike,
Û kiribû ,
Û hêjî nema dibêjim : tê bêrîya min bike ,
Awaz1n tengê te ,
Nema min dihejînin ,
Êdî bêrîya te nakim ,
Nema bi yek care têlêfon dikim ,
Ez nema ji te hezdikim ,
Lê ,belê gulek diÇilmisim bê te ,
Ji dorbûna ,
Ji bêrîkirinê ,

Ez ……….nema…………….,
Dêrik Avdar 2605
Anahîta hemo
---22---

## Ew sirûda niştîmanî

Diyar î giyanê hunermenda hêja
xatûn merziya rezaz î
"Silavî germî," li giyanê pîrozî ,
li giyanê zû firî ji nêv me,di lewendtirinî

gewre ji temenî mîna birûskî ,bighînî,
Ez bi qurbanî,
bavê min ,serkeftina hunera kurdî,
Ax! Ax! Çendî dijware mirna giyanê firiştî,
Şêxo,,merziya, bi bejin û balla,
Çendî hêjaye,cil u Bêrg ên te
Şêrîne,li festivalan nahêle
Rondik ji herikandinê na ,rawestin
Êdi bîn teng bîn ,pîst û pênce
Payîzî, bawernakin,
bawernakin oxir xwestina te
ji nêv me,
sedemên van
hêstiran van
ROBARAN,xweda wê arambike mirovek
HEZKERE , HEZKEREK,BAWERMENDE
Bi rizgariya gelê xwe
Bawermende merziya fariqî
Wê di bin sibêren darên wekheviya esmanî,heydarbike,di buhusta xwede
Nik firistan,pakrewane
PAKREWANA awazên nû dema xweye

Heyîdarbe hevala pêşmergaye,dildare
Hunermende dijiyana

Huneriyê şabanû û Şahinşaha
serbixweye
li nik dayka xwedeyan
Sed lavij diyari

Axa aramgeha te bî.
……………………………:Enahîta HEMO
---23---

# J i  spêdê

**Gulek geşe giha ye,
Laqirdiyê bi min re dike,
Çaw bazînê di gulîstana
Malbatê de,bi rengê xwe
Bi zeredekene,
Bi min re diaxive,
Bipêlên belgên xwere,
Min hişmenddike,
Bi roja bîranîna helbestvanê kurd,cegerxwîn,
Dîsa dengê xwe tevlî gulê,dighîne  cîhan,
Bi tevaya xwe," Ez ji xew rabûm
Min gul firoşek dît",
Pir gelek şabûm can û dil didît,"
Ji min re distirê,
" keçê rabe serî hilde li vî çaxî wiha nabî,
bi nêr jin çûne ezmanan,
Heta kengî tu di xew debî",
Nemiriye civaknasê me kurdan,
Vane wêje nawestin
Di roja oxir xwestinê
Ev roj roja zayîna wêjeyên nû,
Nû kultûr û hunera kurde,
CEGERXWîN, meke nalîn,
Vane xewnê te bi cî dibin,
Tu nemirye,bi mere dijî tevlî janên medibe
Wiha tevlî xweşiyên me,Bi derûnek pakrewane,îro,
Divête em bibin perwane,îro,
Çendî tee m parastin,ji olên gemarê,
" neb ê dine neb ê dîne CEGERXWîne",
Bi her gave tê sohtin,bişavtin,
Ma gelo,çendî hate hêrandin ,dêrandin.
Bi dîlên kevneperestiyê,
Lê hêjî nemiriye,pakrewane,
PAKREWANE,jêre xûzdibim,
Îro roja BîRANîNA,HELBESTVANE,
Penaberê peyva xurte,
Giyanê wî şariyê li me dike,
Şahiyê ji mere dixwaze,
Spêde baş ,
Beyanî baş
HELBESTVANê gelê xwe.**

**Helbestvan:enahîta**

Neynik,

Biyanî Çavandike cobr,
Wan bihêlin bigindirin,
Xunavin,
Li ser dêmên rûy1 min ,
Hunarkên rû geşdikin ,
Bi mafin ,
Eve raste ,dilsozin,
Bi min re ,Dinalim ,
Toza salên burin ,
Dadweşînim .
Ew dema rotîn ,ji qeşa,
Demê diÇirisîne bo min ,
Hest bone qeşa bê Çarin ,
Ji bilî we rondikno,bê hevalim ,
Nikare tu kes bibe hevalê .
Dîliya min ,
Nikare tu kes bibe dosta min ,
Ji bilî firmiskan ,
Ew dikarin ,derînin ,
Volkanên kul û derdên min ,
Ji bilî awazên kevnar ,ji "dengbêjê me,
"Şivanê perwer",
Bi tenha xweme ,
Didim sema ,ji bîranînan,
Demên şahiya zaroktiyê,
Neynika min her Çax û demê ye ,
Lewendtirîn ,ji têbîrên bi tere ,
"yabo", hêjî nebûrîne,
ji demên zaroktiyê,

# helbesta dema min

bi wêjeyên  berberojê
nemirî di bêdengiyekê
û  bê pariyeke kûrdeye
ji zimanê dê
li ser maseke nemirî,vejîne,
ferhenga wergirandina zimanê dê ,
masek xemilandiye,
bi awazên zimanê dê,
vejîne,avjeniyê de ,
li bin rodankek vekirî
li ser çarkinarkên şînahiyê
tevlî hevin gulên Ecemcekê,
bê fêl bazin bê xinizî,
bi berberojê re payedarin dilsozin,
bi rûmetin,
hevalin bê tirsin,bi awazin .
didin sema bi şitlên kolonya re diaxivin
her hênkaya êvarên tîrmehan
bînên xweş diweşînin,
lê mixabin,dil  û hinav bi wan şa nabin
dûrî bajarê evinê xemgîne,
Qamişlo bajarê hebûn û nebûna
çerxa feleka min.

....................Helbestvan  [ENAHîTA HEMO]